

Kurmanji

Faktablad för arbetsökande –  
Stöd till start av näringsverksamhet

2017-01

## Piştewaniya jibo damezirandina xebatê

Heke tu bêkarî û şert û mercên te jibo damezirandina xebatê minasib e, carna dikarî alîkarî û piştewaniyê werbigirî. Navê vê bernameyê *Piştewaniya jibo damezirandina xebatê* ye û di destpêka xebata te alîkariya te dike.

### Gelo ez dikarim jibo destpêkirina xebatekê piştewaniyê werbigirim?

Berpîrsê te ya peydakirina xebatê di destpêkê da şert û mercên te yê peydakirina Şolê dinirxîne. Berpîrsê peydakirina xebatê jibo vî karî tecrubeyên te û zemîneya pêşeyî ku tu dixwazî têda bixebitî hildikolîne, lê rewşa serdest a bazara xebatê jî berçav digire. Tu wek daxwazkerê berî ku li vê bernameyê bêyî pejirandin, gere ku bernameyê xebatê amade bikî û her wiha dive şert û mercên te yê minasib jibo damezirandina karekî li ser esasa wê bernameyê hebe. Eva bi vê wateyê ye ku ev kar dikare sûd û qazanca bi qasî têrê û xebata mayînde jibo te dabîn bike.

Temenê te gere ku herîkê 18 salî be û wek daxwazkerê kar divê te li ba ajansa peydakirina xebatê navê xwe nivîsîbe.

Eger tu dixwazî li bernameya "Piştewaniya jibo damezirandina xebatê" beşdar bibî, carna dikarî jibo wergirtina tecrubeyê li warekî diyarkirî da ku dixwazî karê xwe li wî warî da damezirîni, derfeta hînbûna xebatê bi dest xîni. Eger berî viya tu kar û xebata te tunebûye, dikarî jibo hînbûna qanûnên kar, beşdarî dewreya hînbûna seretayî bibî.

Ev mijar girîng e ku karê xwe berî dayîna guwahînameya bernameya "Piştewaniya jibo damezirandina xebatê" ji aliyê berpîrsê peydakirina xebatê, dest pê nekî. Eger visa nekî û eger şirketa te berî wê dest bi xebatê kiribe, dê şert û mercên te jibo wergirtina alîkariyê tunebe.

### Gelo ez destheqekî werdigirim?

Tu di dema beşdariya li vê bernameyê û damezirandina karê xwe, piştewaniya çalakî û alîkariya xercê geşepêdanê werdigirî. Saziya Dabînkariya (Sîgûrteya) Civakî qasa xercê piştewaniya ji çalakiyê hesab dike û piştî piştastkirinê raber dike. Zanyariyên

zêdetir li bara alîkariya xercê piştevanî û geşepêdan û pêşketinê li belgeya zanyariyan an malpera forsakringskassan.se bibîne.

### **Heta çi wextê ez dikarim alîkariya xercê çalakiyê werbigirim?**

Tu dikarî heta herî pirr şeş mehan alîkariya xercê çalakiyê werbigirî. Ev alîkariya xercê renga di şert û mercên taybet da zêde bibe, lê ev yek tenê di demên ku nexweş dibî an desthilatdariyên çavdêriya te bikeve derengiyê, tê sepandin.

### **Gelo ez dikevim ber sîgûrteyê (Bîmeyê)?**

Tu di dema piştevaniyê da dê neyê sîgûrtekirin. Ew kesên ku li nav bernameya "Piştevaniya jibo damezirandina xebatê" û di bin misogeriya şolfî û geşepêdan û pêşketin û garantiya ciwanan in jî dê neyên bîmekirin (Sîgûrtekirin). Tu gere bi xwe bikevî bin sîvana sîgûrteyê.

### **Her kesek çi karekî dike?**

Eger dixwazî zanyariyên zêdetir li bara piştevaniya ku di dema damezirandina karekî werdigirî, bizanî, dikarî digel Arbetsförmedlingen peywendiyê bigirî. Ev xala girîng e ku te li ser berûlayên cûrbicûr ên karê xwe fikirîbe ta ku bikarî tam wê jibo me rave bikî û bernameya xwe ya xebatê û xercên xwe rabe bikî. Bi alîkariya rawêjkarên pispor ên malî, em rewşa te ya jibo damezirandina xebatê û eva ku gelo te ev şert û merc hene, dinirxînin.

### **Gelo ez dikarim alîkariyeke zêdetir werbigirm?**

Damezirandina kar, çi bi awayê takekeî û çi bi alîkariya kesên din, hewcedara zanistê ye û rîska wê heye. Em dikarin berî damezirandinê û di dema çalakiyê da rawêjkariyê rabe te bikin. Li hin deveran em her wiha civînên şewirîn û dewreyên teze yên xebatê rabe dikin.

Her wiha gellek beşdarên din jî hene ku dikarin dema damezirandina xebatê alîkarî û rawêjkariyê bidin te; wek mînak:

**Verksamt.se.** Jibo kesên ku dixwazin kompaniyekê damezirînin, rêvebiriya tomarkirina kompaniyên, rêvebiriya bac û xeracê û taxima geşepêdanê malpereke tijî ji zanyariyên giştalî damezirandine. Tu dikarî di rojên destpêka xebata xwe beşdar bibî, bernameya xwe ya ticarî amade bikî û karê xwe tomar bikî. [www.verksamt.se](http://www.verksamt.se).

**ALMI.** Alîkariya kesên ku li fikra damezirandina xebatê ne û kesên ku xebata xwe destpê kirine, dike. Li her beşê li ber destan e. [www.almi.se](http://www.almi.se).

**Kompaniya Tora Ewropayê.** Pirsên te li bara Yekîtiya Ewropayê û Bazara Ewropayê dibersivîne. [www.euroinfo.se](http://www.euroinfo.se), 020-93 10 10.

**Binyata Navenda Rawêjkariyê ya IFS'ê.** Bi awayê muşexes û diyarkirî alîkariya kesên ku li derveyî Swêdê hatine dinyayê dike (Jibo damezirandina karekî). Rawêjkariya

belaş bi zimanên cûrbicûr. Navendên cûrbicûr ên rawêjkariyê li seranserî welêt hene.  
[www.ifs.a.se](http://www.ifs.a.se), 08-693 99 45.

**Nyföretagarcentrum.** Rawêjkarî û alîkariya belaş. Li paş Nyföretagarcentrum toreke herêmî ya berfire pêkhatî ji kes û kompaniyan heye ku berî destpêkirina xebatê rawêjkariyên pisporî raber dike. Li zêde ji 100 şûnan li ber destan e.  
[www.nyforetagarcentrum.se](http://www.nyforetagarcentrum.se).

**Hevrê – Geşepêdan û pêşketina bi hevkarîyê.** Bo kesên ku dixwazin bi alîkariya hevdu îdeyên xwe berfire bikin xizmetên rawêjkariyê raber dike. Li her beşê li ber destan e.  
[www.coompanion.se](http://www.coompanion.se), 08-702 54 43.

**Têkiliyên din.** Wek Bank, Nivîsgehên Ticarî û saziyên Sivîl.

## Qanûn û qirar

Qanûnên (2000: 634) li bara bernameya bazara xebatê

Qanûnên (1996: 1100) Li bara piştevaniya çalakiyê

Hikma (2007:414) Li bara misogerkirina şol û geşepêdanê

Hikma (2007: 813) Li bara misogerkirina sole jibo ciwanan

Jibo wergirtina zanyariyên zêdetir digel reqema têlêfona 0771-416 416 digel me peywendiyê bigire. Her wiha dikarî serî li ajansa herî nêzik a peydakirina xebatê an malpera arbetsformedlingen.se bidî.